

Kurdî

FORMA GILÎ KIRINÊ

Şîreta giştî

Kî dikare gilî bike?

1. Eger hûn bibawerin ku xebatên karmendan yan pêk neanîna berpirsiyên wan di çalakiyek Frontex de bandor ji we kiriye¹ û hûn difikirin ku yek yan çend mafên we yê bingehîn ji ber çalakî yan bêçalakiyê hatine binpê kirin, hûn yan kesek an partiyek li ser navê we tevdigere, dikare li bal Ajansa Zêrevaniya Sînor û Peravê Ewropî, Frontex gilî bikin. Ji bo dîtina lîstek ji *Babetên Binpêbûna Gengaziya Mafên Bingehî n di Maweya Çalakiyan de* serdana *Agahiyên Bêtir* di beşa mekanîzmaya giliyan di malper ajansê de bikin.
2. Her partiyek (ji bo nimûne kesek din, parêzer, rêxistin, endamê malbatê, sergêrê qanûnî, û hwd) dikare bibe nûnerê we. Her partiyek dikare li ser navê we giliyê bike.
3. her kes eger liser binpêkirinên rêgezên karanîna hêzê² ji aliyê karmendan ku Frontex wekî endamên tîmê şandine, gumanbar be, dikare wan babetan ragihîne.
4. Dozên têkildarî bi cend gilîkeran jî dikarin werin şandin.

Çawa ez dikarim gilî bikim?

5. Divê giliya we **bi ivîsandî in** radest bibe. Berpirsiyarê Mafên Bingehînê Frontex (FRO), pisporek serbixwe ye ku çavdêriya mafên bingehîn di Frontex dike û vê pêşdixe, tê giliya we lêkolîn bike. Bikaranînê vê forma giliya tê alîkariya FRO bike ku giliyên we bi bandortir pêvajoyê biken, lê hûn dikarin bi karanîna rêbazên dinê nivîskî jî giliya xwe radest bikin. Di her gavekê jî vê pêvajoyê de, dibe ku FRO ji we daxwaz bike ku di agahiyên bêtir, belge an vebêjên zêde li ser giliya xwe bidin. Ji bo vê sedemê, girîng e ku hûn agahdariyên têkiliya xwe destnîşan bikin.
6. Bi her zimanî hûn dikarin giliya xwe bişînin. Formên giliyê bi gelek zimanan hene.
7. Ji bo giliya we çî sînorek ji bo dirêjbûna naveroka vê tune, lê çêtir e ku hûn hemî agahdariyan di **herîzêde 15 rûpelan** de cih bikin.
8. Pêdivî ye ku hûn giliyê xwe di nav yek sale ji roja binpê kirina mafên xwe yê bingehîn ku hûn îdfîa dikin an ji roja ku hûn di derbarê wê de hatine agahdarkirin, an we dikarî hûn gilî bikin, giliya xwe radest bikin.

¹ Çalakiya Frontex pêk tê ji operasyonek hevpar, projeya ceribandî, destwerdana bileza sînorî, şandina tîmê piştevaniya ji rêveberiya koçberiyê, operasyona veşerê, destwerdana veşerê an çalakiya operasyona ajansê li welatek sêyemîn de. Ji bo agadarbûna ji pênaseyên van çalakiyan, ji kerema xwe serdana li rêzîknameya (YE) 2019/1896 roja 13 Mijdara 2019, Beşa Zêrevaniya Sînor û Peravê Ewropî bikin. (OJ L 295, 14.11.2019, r. 1).

² Ji kerema xwe serdana Rêzîknameya 2019/1896 pêveka V li ser rêgezên karanîna hêzê, di nav de perwerde û amadekirin, kontrol û karanîna çekên rêxistinî û alavên din yê nekujer, ku karmendên şandiyê Frontex wekî endamên tîmê têkildarî vê dibin.

9. Hûn di giliya xwe de tenê dikarin li ser bingeha rastiyên çêbûne an jî bandorên wan heta piştî 6-ê Oktobera 2016-an mane, behs bikin³, wekî din giliya we nayê qebûl kirin.
10. Pêwîst nake ku berî radestkirina giliya xwe gavên giştî bavêjin.
11. Giliya li bal Frontex nabe sedem ku hûn nekarin bigehin formên din ên gilîkirinê, wekî dadgehên neteweyî an ewropî.
12. Divê hûn **rastiyên heyî** di giliya xwe de bi hûrî şirove bikin, **û heta gengaz be diyar bikin ku** bandora ew çalakîyan an bêçalakiyan li ser mafên weyên bingehîn, çi bûye.
13. Radestkirina giliyê **belaş** e.

Piştî gilî kirinê çi dibe?

14. Frontex û FRO agahiyên hemî giliyan wekî **nehênî** radigirin, xênjî ku hûn di vê formê de an jî formek din a nivîskî de ji mafê xweyê nehênîbûnê derbas bin.
15. Eger giliyê we li ser çalakî yan bêçalakiya endamek ji tîmên yek ji welatên endamê beşdarker ku ji bo pêkanîna çalakiyek Frontex hatibe şandin, FRO tê giliya we radestî rayedarên neteweyî ku lêpîrsîna giliyan kesan dikin û herwisa ji sazîyên neteweyî yê mafên bingehîn re dişîne. FRO tê we agahdar bike ka kîjan rayedaran giliya we standine. Eger hûn dixwazi ku FRO agahdariyên we yê kesane ji rayedarên pêwendîdar re bişînin divê hûn bi taybetî razîbûna xwe ragehînin (Serdana Beşa 5-a forma giliyan bikin).
16. Eger FRO giliya we nepejirîne, ew tê sedeman ji we re binivîse û eger gengaz be tê bijareyên din ji bo çareserkirina fikarên we pêşniyarî we bike.
17. Pêdivî ye ku her guherînek di navnîşan, email an agahdariyên dinê têkiliya gilîker bilez ji FRO re werin agahdar kirin.

Ji bo bidestanîna agahiyên bêtir derbarê mekanîzmaya giliên Frontex hûn dikarin serdana malpera ajansê bikin: www.frontex.europa.eu/complaints

1. Agahdariyên di der barê gilîker(gilîkeran)

*Têkiliya we bi radestkirina vê giliyê:
(Ji kerema xwe bijareya kêrhatî hilbijêrin)*

Kesê (Kesên) binbandor

Nûnerê) binbandor

Kesê ku gumanbare ku karmendên Frontex ku wekî endamên tîmê tê karanîna, li bikaranîna hêzê rêbazên bînpê dikin

Ji kerema xwe herîkê agahdariyek têkiliyê ji gilîker an nûnerî bidin.

Nûner:

³ Roja sepandina Rêzîknameya (YE) 2016/1624 Di beşa Zêrevaniya Sînor û Peravê Ewropî (European Border and Coast Guard).

GILÛKER:

Paşnav:

Nav:

Temen li ser 18 saliyê: Erê Na

Netewe (ger diyar be):

Eger bênetewe be, ji kerema xwe rûniştgeha xwe yê dawî desnîşan bikin:

Navnîşan ji bo pêkanîna têkiliyan:

Kodeya Postê:

Bajar:

Welat:

Email:

Telefon (ji kerema xwe kodeya welat û herêmê diyar bikin):

Feks:

Agahdariyên dinê têkildar:

Ji bo dozên ku zêdetir ji yek gilîker tê de ne, ji kerema xwe ji bo her kesê daneyên kesane binivîsin.

HER PARTIYA NÛNER:

Paşnav:

Nav:

Têkiliya bi gilîkerî:

Ger pêwîst be navê rêxistinê:

Navnîşan ji bo pêkanîna têkiliyan:

Kodeya Postê:

Bajar:

Welat:

Email:

Telefon (ji kerema xwe kodeya welat û herêmê diyar bikin):

Feks:

Agahdariyên dinê têkildar:

Hişyarî: Ji bo gilîker razîbûna xwe li ser hebûna nûnerî nîşan bide divê dawiya ev forma gilînameyê îmze bike. Eger gilîker ji ber sedemên kêrhatî nikaribe forma giliyê îmze bike (Ji bo nimûne, ji ber mirinê, winda bûnê, girtîbûna bêy mafê hevdîtîne, nexweşbûnê, nexwendewerî û hwd) an sedemên din ên berbiçav ji bo radestnekirina destûra nivîskî ji bo nûnertiyê bide we xwe, ji kerema xwe sedemên xwe şirove bikin:

2. Agahdariyên li ser bînpêkirina mafên bingehîn an qanûnên li ser sepandina qanûna bikaranîna hêza îdîakirî

Ji kerema xwe agahdariyan li ser bînpêkirina mafên bingehîn an qanûna bikaranîna hêza îdîakirî ya îdîakirî di nav de roj, cihên, şiroveyên li ser çalakî yan bêçalakiyê û karmendên ku tevlibûnê destnîşan bikin. Ji kerema xwe şirove bikin ka bibawera we ev çalakiyan çawa bandorê li mafên bingehîn yê we an ên kesên ku hûn nûnertiya wan dikin, dikin:

- a) Roj û dema texmînî ya bûyer(bûyeran):
- b) Cî/Welat:

Eger cîhê rastîn nediyar be, ji kerema xwe şiroveyên berfireh li ser cîhê ku ew bûyer tê da qewimîne, radest bikin:

- c) Danasîna berfireh a kes(kesên) ku hûn jê gilî dikin. Heta cîhê ku hûn dizanin, şirove bikin ka ev gilî têkildarî çalakî yan bêçalakîtiya kîjan ji kesên jê re têkildare (hemî babetên ku rastin, nîşan bikin):
 - I. Kesên ku cilên yekrengê Frontex yê şîn xwe dikin ku bi banda sînga ya şîne esmanî ve têne nas kirin.
 - II. Kesên bi milbenda şîna ronahî ya Frontex
 - III. Kesên bi karta nasnameyê Frontex
 - IV. Kesên ku cilên netewî yê cîhê ku têda dixebitin li xwe dikin
 - V. kesên din, wekî wergêr, ajokar û hwd.

Agahdarî liser kesên ku têkildarin (ji bo nimûne, nav, danasîna kincî, ziman, sometê xuya, kar an erka ku pêşkêş dike, hwd):

d) Danasîna berfireh liser bûyerê, ku eger gengaz be bi rêza qewimînê. Eger bînpêkirinê hîn jî berdewam e, ji kerema xwe diyar bikin:

e) Eger gilî liser bînpêkirina mafên bîngêhîn e, ji kerema xwe şiroveyek berfireh liser vê yekê ku bûyera li jor hatî diyar kirin çawa bandor li we kiriye û çawa mafên bîngêhîn yê we bînpê kirine, radest bikin (ji bo navnîşê Ji bo dîtina lîstek ji *Babetên Bînpêbûna Gengaziya Mafên Bîngêhîn di Maweya Çalakiyan de serdana Agahiyên Bêtir* di beşa mekanîzmaya giliyan di malper ajansê de bikin:

3. Radestkirina giliyê ji rayedarên din

Hişyarî: Pêwîst nake ku berî radestkirina giliya xwe ji Frontex re gavên giştî bavêjin.

1) Gelo we berê li dadgehekê (ji bo nimûne, neteweyî, ewropî, û hwd) gilî radest kiriye? Ji kerema xwe rewşa heyî û encama pêvajoya lêpirsînê, eger diyar be, destnîşan bikin:

2) Gelo we giliya xwe li radestî saziyê din kiriye (ji bo nimûne, lêpirsek neteweyî, saziyek mafên mirovan a neteweyî, û hwd)? Ji kerema xwe navê saziyê, rewşa heyî û encama pêvajoya lêpirsînê, eger diyar be, destnîşan bikin:

4. Kopyên belgeyên piştgiriye

1) Ji kerema xwe **kopyên** hemî belgeyên piştgiriye heyî û peywendîdar bi giliya xwe re radest bikin. **Nimûneyên** ji van belgeyan pêk tên ji:

- Kopyek nasnameya xwe, pasaport an belgeyên din ên nasnameya xwe;
- Kopyên her belgeyekê, wêne, vîdeo, rapor, bawername, şahidîname yan belgeyên din ên piştgirî yê têkildarî giliya we;
- Eger we giliya xwe radestî dadgeh an saziyên din kiroye, kopyên forma gilî, daxwazname, an biryarên têkildarî van pêvajoyan.

2) Eger hûn nekarin belgeyên piştgiriye radest bikin, ji kerema xwe destnîşan bikin:

Hişyarî: Ji kerema xwe belgeyên xwe yê resen radest nekin ji ber ew ji we re nayê vegerandin

5. Nehênîbûna agahiyan û daneyên kesane

Bi radestkirina vê giliyê hûn qebûl dikin ku agahdariyên kesane yê we ji aliyê Berpirsiyarê Mafên Bingehîn (FRO) ve were pêvajoyê kirin. Ji kerema xwe agahdariyên bêtir li ser pêvajokirina daneya xwe li ser daxuyaniya nehênîtiya li jêr bibînin.

FRO bi nehênî giliya we lêkolîn dike. Eger giliya we nepejirîne, giliya we dê ji bo şopandinê ji rayedarên şareza (Rêveberê Birêvebirina Frontex û rayedarên neteweyî yên Dewletên endamên têkildar) re were şandin û dê ji saziyên mafên bingehînê neteweyî yê têkildar re were şandin.

Ji kerema xwe piştrast bikin ku hûn bi zelafî dihêlin ku FRO daneyên we radestî rayedarên şareza û rayedarên mafên bingehîn re radest bike. Eger hûn biryar bidin ku daneyên xwe parve nakin, dibe ku ew rayedar giliya we red bikin.

Bi wî awayî ez razî me ku daneyên min yê kesane ji Rêveberê Birêvebirina Frontex û rayedarên neteweyî yên Dewletên endamên têkildar û saziyên mafên bingehîn yên neteweyî, eger gengaz be, were radest kirin (ji kerema xwe nîşan bikin):

ERÊ

NA

6. Qerebûya ziyanan

Eger giliya we were pejirandin, hûn difikirin ku Frontex an saziyên din dikarin çi bikin ku qerebûya ziyanan bikin?

7. Radestkirina giliya xwe

Hûn dikarin bi awayên jêrîn gilî û pêvekên pêwîst radest bikin:

- Email: complaints@frontex.europa.eu
- Malper Frontex: www.frontex.europa.eu/complaints
- Rasterast yekser ji karmendên Frontex li cihê ku çalak e.
- Post: Frontex - Berpirsiyarê Mafên Bingehîn, Complaints
Plac Europejski 6
00-844 Warsaw
Poland

Eger hûn vê forma elektronîkî radest bikin, ji kerema xwe nav û paşnavê xwe li jêr binivîsin:

Roj:

Gilîker:

Roj:

Partiya Nûner:

Mekanîzmaya giliya Frontex DAXUYANIYA NEHÊNÎTIYÊ

1. EM KÎJAN DANAYÊN KESANE KOM DÎKÎN?

Daneyên kesane yên ku hûn bi giliyê radest dikin, di nav de navê we, agahdariyên têkiliyê yan belgeyên piştgiriyê (yên wekî raporên tenduristiyê yan polîs an wêneyên).

2. ÇIMA EM DANAYÊN WE KOM DÎKÎN?

Daneyên we dê werin pêvajo kirin da ku Berpirsiyarê Mafên Bingehîn (FRO) û karmendên Nivîsgeha Mafên Bingehîn, ku berpirsiyarin liser lêkolînkirina gîlîkirina we, karibin giliyê we pêvajoyê bikin û lêpîrsîn bikin.

3. BINGEHA QANÛNÎ YA PÊVAJOYÊ

Madeya 111 Paragrafa 11 ya Rêzîknameya (YE) 2019/1896 bingeha qanûnî ye ji bo pêvajo kirina daneyên we. FRO li ser bingeha Madeya 5 Paragrafa 1 ji Rêzîknameya (YE) 2018/1725 tê daneyên we pêvajo bike⁴. Bi radestkirina giliyê, hûn dipejirînin ku dane werin pêvajo kirin. Mafê we heye ku hûn vê razîbûnê hertim betal bikin.

4. KÎ DANAYÊN WE KOM DÎKE?

FRO, ku kontrolkerê daneyan e, dê daneyên we kom bike. Hûn dikarin bi rêya complaints@frontex.europa.eu bi FRO re têkilî bikin.

5. YÊ DÎN KÎ DİKARE DANAYÊN WE BÎBÎNE?

Tenê bi razîbûna we, FRO û karmendên Nivîsgeha Mafên Bingehîn, ku berpirsiyarê lêpîrsînkirina giliyê we ne, dikarin daneyên we radestî kesên jêr bikin: Rêveberê Birêvebirina Frontex û rayedarên neteweyî yên Dewletên endamên têkildar û saziyên mafên bingehîn yên neteweyî; Ragihandina daneyên we ji van kesan re girêdayî kesê ku bi îdîaya we mafên we bînpê kiriye, û herwisa mafên ku bi îdîaya we hatine bînpê kirin ve girêdayî ye.

Eger hûn nerazî bin, daneyên we nayên eşkere kirin. Divê hûn zanibin ku eger ew rayedar giliyên bênav qebûl nekin, eger hûn nerazî bin gengaze giliya we red bikin.

Daneyên we ji welatek sêyemîn an saziyek navneteweyî re nayê parve kirin.

⁴ Rêzîknameya (YE) 2018/1725 ya roja 23-ê Oktobera 2018-an li ser parastina kesên heqîqî li ser pêvajokirina daneyên kesane ji aliyê sazî, rêxistin, nivîsgeh û saziyên Yekîtiyê ve û li ser veguhastina belaş a van daneyan. (OJ L 295, 21.11.2018, r. 39-98).

6. HETA KENGÊ DANeyÊN WE TÊN RADİGİRTİN?

Daneyên we dê heta sê (3) salan werin ragirtin. Eger heman gilî li dadgehên neteweyî an navneteweyî re bête radest kirin, ji ber pêvajoya lêpîrsîna gengazî dê daneyên we pênc (5) salan werin ragirtin. Maweya ragirtinê ji dema girtina dozê dest pê dike. Piştî vê heyamê, dane dê werin jêbirin.

7. MAFÊN WE ÇI YE?

Mafê we heye ku hûn bigihin daneyên xwe û ji FRO bixwazin ku daneya we serrast bike an jê bibe an jî pêvajokirina wan bi sînor bike. Hûn dikarin li ser www.edps.europa.eu li bal Çavdêrê Parastina Daneyên Ewropî (European Data Protection Supervisor) gilî bikin. Eger her şiroveyek ji were pêwîst bike, hûn dikarin bi rêya Berpîrsê Parastina Daneyê ya Frontex re bi riya dataprotectionoffice@frontex.europa.eu têkiliyê bikin. Li ser daneyên we çî biryarên jixweber neyên derçûn.

8. KESÊN DİNÊ Dİ GİLİYÊ WE DE HATÎNE BİNAVKİRIN

Eger we di giliya xwe hinek dane di derbarê şahidiyan, kesên ku li gor îdîaya we mafên we bînpê kirine, an kesên din agahiyan bidin me, FRO û karmendên Nivîsgeha Mafên Bîngehîn, ku ser lêpîrsîna giliya we de berpîrsiyar in, dê ev agahdariyan jî pêvajoyê bikin. Eger gengaz be, dê ev kes ji pêvajoyê kirina daneyên xwe agahdar bibin.